Çûyîna şandeya jinan ya navnetewî di çarcoveya kampanya ‘Azadiya Jinên Şengalê Azadiya Mirovahiyê ye’ ber bi Rojava ve

Em niha nû ji Rojava vegeriyan, li qada xweseriya demokratîk li bakûrê sûriyê bûn. Em dixwazin li vir yekser rave bikin ku mîsyona jinê bi awayekî pêşeng di avakirina civakek demokratîk de xûya ye.
Vêya jî li ser hîmê azadiya jinê bi zanistiya azadiya ferdek li ser esasê wekheviya zilam û jin pêk tê. Wana şoreşek pêk anîn û hîna jî dijîn rûxmî ku li beramberî çeteyên faşîst yên DAÎŞê û hêzên emperîalîst yên sûriyê berxwedaniyek dijwar pêk tînin.

Em bi xwe vêya wek şoreşek femînîstan dinirxînin. Ev şoreş rastiya pêkanîna şoreşek zêhnî ye yên li ser bingeha xwe pirsiyarkirina hemû şêweyên bindestiyê yê çîn, zayend, çand û gelan xwe ava dike. Bêgûman vêya dikare wek encamên tehlîlkirina radîkal ya dîroka 5 hezar sal ku li ser jinê koletiyê dide ferz kirin bê destgirtin. Dîrokek ku rûxmî hewldana zêhnniyeta desthilatdar yên emperîyalîst ku jinê bide îmha kirin, di cewhera xwe de esas dîrokek li ser hîmê perspektîfên xweser ya berxwedaniya jinê ye.

Şandeya jinê ku ji aliyê nûnertiya navnetewî ya tevgera jina kurd ve li Ewrûpayê hate ava kirin bi hevkariya tevgera xweser ya femînîstan derbasî meriyetê bu. Ji 22.Mijdarê heyanî 29.Mijdarê pêk hat. Endamên şandeyê ji Italiya, Almanya, Avûsturya û Fransayê bûn. Temenên endamên şandeyê jî di navbera 25 heyanî 75 salî bûn.

Di dema ku li qada Ewrûpayê di çarcoveya roja navnetewî ya dijî şîdeta hemberî jinê li gelek bajaran çalakiyên jinan bi pêş ketin, me jî xwest girêdanbûna xwe ya bi şoreşa jinê ku li Rojava bi berxwedaniya Kobanê di asta herî jor de diyar dike, di avakirina şandeyê de derbixînin der.
Me silavên pişgiriyê ji 12 de rêxistinên fêmînîstinan ji bo tevgera jinê ya li Rojava parve kir.

Şandeya Jinê ji aliyê hikûmeta federal a Kurdistanê 2 rojan rastî astengiyê derbaskirina Rojavayê Kurdistanê bûn. Di wê demê de li Rojava tevgera jinê di dema 24. Mijdarê de Kongreyek Jinê li dar xistibu, herî kêm 300 Jin beşdarî kongreyê bûn û di roja 25. Mijdarê de li hemû kantonan û bajaran meşên jinan yên girseyî hatin li dar xistin.

Armanca me ya şandeya jinê xwe gihandina jinên rojavayê Kurdistanê bû. Şêwazên xwerêxistinkirinê nas bikin û di heman demê de jî pêwîstiyên jinê ji nêz ve fêhr bibin, da ku em bikarîbin çêtir perspektîfên û tehlîlên jinê binasin.
Me dizanî ku şerên li Rojhilata Navîn ku dijî tevgera azadiya kurd tê meşandin, li ser esasê berjewendiyên hêzên emperiyalîst yên Yekitiya Ewrûpayê di warê siyasî û ekonomî de bikarîbin bi darê zorê xwe têr bikin. Hewl didin di warê dewlemendiya erdnigariya Kurdistanê sûdê werbigirin. Dîsa jî em di wê zanebûnê de bûn ku di raporên ku ji aliyê dewletên ewrûpayî ve hatin amadekirin, dewsa têkoşerên jinên berxwêder bidin rave kirin, jinan daîmlî wek objeyên seksê bi kar tînin. Divê bi perspektîfên radîkal yên demokratîk yê bi azadiya jinê ve girêdahî ye di hemû beşên civakê de tevbigerin.

Berxwedana jinan di heman demê de têkoşîna azadiya jinên kurd, ereb û asûrî ne ango yên jinên cîhanê bi gişti ne. Têkoşîna rûmetê û mirovahiyê ye. Jinan di eniya herî pêş de dijî DAÎŞê wek hêzek xweser şer dikin. Her wekî din jî xwe xweser bi rêxistin dikin, di hemû beşên civakî de pêşengtiya xweseriya demokratîk dikin. Jinan dijî pergala desthilatdariyê û zayendperestî yên hindirê civakê wek yên ji civaka êzîdî bigrin heyanî ereban, lê beramberî wê jî dijî pergala modern a kapîtalîst yê ewrûpayî û rojhilata navîn têdikoşe. Berxwedana wan nêrîna rasîst bi awayekî bingehîn hildiweşîne.

Dema em gihan Hewlêrê bajara hikûmeta federal a Kurdistanê, em bi alîkariya endama şandeyek dîtir ku wek parêzer ji bo mafê jinan û mirovan dixebite, rastî nûnerek civaka êzîdî û jinek êzîdî ku ji destê DAÎŞê xwe rizgar kiriye hatin. Tê gotin ku di navbera 2 Hezar û 7 Hezar jinên êzîdî û keçên êzîdî hatin revandin û hetanî niha 305 jin dikarîbûn xwe wek koleyek seksê ji destê DAÎŞê xwe rizgar bikin. Rizgarkirina wan keçan wek perçeyek ji berxwedaniya heyî tê dest girtin.

Di roja yekemîn ya serlêdana me ya Rojava em çun qampa penaberan a Newrozê ku nêzî 5000 heyanî 6000 penaberan li wir bi rêxistinkirinek xweser dijîn. Lê pêwîstiyên jiyanî pir heye. Ji sohbe heyanî kon û bi hatina zivistanê jî pêwîstî bi kincan û makîneyên dûrûtinê heye. Wan alîkariyên ku bi sozek ji aliyê dewletên Ewrûpa û Netewên Yekbûyî ve hatin gotin tû car negihan vir.

Heyanî roja çaremîn me serlêdanên tevgera jinê ya karê derva û komîteyên jinan yên cur bi cur kirin. Jinên ku me dîtin xwe wek fêmînîstan dibînin. Wana dibêjin, ku mîrateya femînîzmê radikin û bi zanista jinê ya gerdûnî li gel têkoşîna azadiya jinê di çarcoveya tevgera azadiya jinê mezintir dikin. Me hevdîtin bi çalakvanên û nûnerên Tevgera Jinê ya Yekitiya Star, ya kooperatîfa jinê, ya navenda perwerde û zanista jinê, ya navenda jinê ya SARA yê ku dijî şîdeta jinê dixebite, ya akademiya jinê, ya akademiya zanistên civakî û mezopotamiyayê, ya zanîngeha zimanê dayîkê û ya ragihandina jinê çê kir.
Dîsa jî em çûn serlêdana şehîtgeha hemû têkoşerên tevgera azadiyê û me bi asayîşa jinê û ya yekîneya parastina jinê YPJ hevdîtin pêk anî.

Nûnerên wan beşên ku me rave kir xwedî malek xwe yên taybet nînin, lê dem dem li gel malbatan dimînin, da ku bikarîbin bi pirsgirêkên civakê re eleqedar bibin û bikarîbin çareser bibin. Nûnerên, çalakvanên û têkoşerên kurd bi dilxwazî dixebitin. Pêwîstiyên xwe yên jiyanê, xwarin û kincan ji berhemên kolektîf digirin.

Me bi çavên xwe bi xwe dîtin çawa civakek femînîst tê ava kirin, li ser hîmê afirandina azadiya jinê di hindirê malê, di têkiliyan de, di dema berxwedana dijî şîdetê, di seknên zilaman de, di dema ku hewldanên rastiyan berovajî kirin û di beşên bi rêxistinkirî û civakî de, xwe zana kirin, xwe naskirin, xwe tevlî kirin û pêk anîn…

Bi şev em li gel malbatan man û di dema rojê de bi hevdîtinên bi ‚dest û lingan’ derbas kirin, bi ken û çîrokan derbarê karên rojane, ji guhertinên rojaneyî yên jinan, yên girtîgeh û berxwedanê.

Ji tûra me ya hevdîtinan em pir matmayî û heyecan bûn û spasdariya xwe ji hemû hevalan yên ku me dîtin dikin. Spas ji bo mêhvanperestiya wan.

Şoreşa jinê gengaz e.

Divê tevgerên jinan yên Ewrûpayê divê rabin ser xwe û bikevin tevgerê, di warê piştgirîdayînê û ji bo têkoşîna hevbeş ji bo şoreşek civakê li ser hîmê azadiya jinê divê xwe mezin bikin. Divê em di heman demê militarism û propagandayê şer yê li ewrûpa heye bi têkoşînek xurttir derbas bikin.

Jinên li Rojava beşa xwe dikin. Niha dora me hatiye.
JİN JİYAN AZADİ

Şandeya navnetewî ya jinê, Kanûn 2014